
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (230):

**Gundê "Şadêrê" - guhertineke demografî ye fere, girtinine bêsûcane, qutkirina darên zeytûnê bi rengekî fere, bargeheke Turkî ye nû, geregoşî û serberdayetî**









مزار الشيخ ركاب الإيزيدي في قرية "شاديره" جنوبي عفرين، قبل وبعد التخريب





قطع أشجار الزيتون في قرية "ماراته" غربي مدينة عفرين



تل مدخل بلدة راجو شمالي عفرين، المزمع بناء قاعدة عسكرية تركية عليه، كانون الثاني ٢٠٢٣م

Armanca Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê û nandozên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" yên pêve girêdayî talankirin û roxandina malmewdanên Efrînê bi giştî ye, û pêdaçûna di qutkirina darên zeytûnê de -jêdera serekîn a jiyana xelkê- bi rengekî fere û bêwijdan li vê Zivistanê wê tekez dike û asta kîndariya ku di derûna wan de veşartî nişan dide, bi ser hemî bangewazî û riswakirinên ragihandinî de yên ku daxwaza rawestandina binpêkirin û tewanên têvel dikin.

**Ev jî binpêkirin û tewanin têvel in:**

**= G. "Şadêrê":**

Ji gundên Şêrewa ye, bi navça Navenda Efrînê ve girêdayî ye, bi Başûr ve /20/KM jê dûr e, ji dora /120/ malan pêkhatî ye, dora /700/nişte ji niştecîyê Kurd -piraniya wan Êzdî- têde bûn, piştî dagîrkeriyê /65 malbat = 200 nişte/ jê man û yên din zorane koçber bûn, û dora/400 malbat = 2400 nişte/ ji anîndeyan têde û di çadirên li dorê û gundê "Besme" de -yê niştecîkirinê û li Başûrê gund- hatin niştecîkirin.

Li 4.10.2021an. Z, G. "Besme" yê niştecîkirinê yê nimûneyî -yê ku li Reşmeha2021an. Z avahiya wê hatibû destpêkirin- hate vekirin, asta yekem jê ji (/8/ yekîneyên niştecîbûnê = 96 perçemal, her perçemalek 50 M çarkoşe), mizgeft, dibistan, navendeke tenduristî û binevahiyeke giştiyane (ava vexwarinê, elektirîk, toreke riyan û xerckirina avagilgemarê) pêkdihat, peredandin jî ji komeleyeke Kiweytî, û li ser erdekî li Cîgeha "Geliyê Şadêrê - Taqilkê" - Başûrê gund ê Hemwelatî "Ziyad Hebîb" ji xelkê G. "Şadêrê" -yê ku neçar bûyê bifroşe- hatiye avakirin.

Û li 29.3.2022an. Z, asta diwem ji gund (/8/ yekîneyên niştecîbûnê yên nû - 125 perçemal) hate amedekirin, û avakirina /6/ yekîneyên din jî berdewam e.

Milîseyên "Feyleq El'şam" gund desteser dikin, wan dest danîn ser dora /40/ malî tevî tiştmiştên têde û anînde têde dan rûnişkandin, û ji malên din jî xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektirîkê û hin tiştên din dizîn, û herweha jî du makîne yên herdu malbatên "Ehmed Nasêr Şemo, Malêk Reşad", guheztok û keblên toreya elektirîkê ya giştî û hin dîrakên wê, û kebil û dîrakên toreya telîfûna zemînî.

Û wan dest danî ser malmewdanên koçberên zorane, vêrgiyên têvel li ser werzên çandiniyê ferz dikin, û ji bo lêgerîna li keveneşop û kinzên binerd û dizîna wan, gelek cîgehên li dor gund kolan.

Herweha zaretgeha "Şêx Rikab" ya Êzdî li gund, li ser destên milîseyan du caran rastî roxandin û hilweşandinê hat; Cara yekê li Havîna 2019an. Z, beşekî mezin ji dîwarî wê yî Başûr hate roxandin û nêzîk gorgehê jî hate kolandin; Û cara diwem li 2-3 .10.2019an. Z, bi şêwakî fere hate hilweşandin, û ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd, gorgeh ji holê hate rakirin û binî hate kolandin.

Û çêrandineke bêwijdan û hovane ji keriyên pêz û dewêr re di nav zeviyên çandiniyê û baxçe û zeviyên darên meywan de tê kirin, û dema ku xelk nerazîbûna xwe didin xuyan, şivan li dijî wan derdikevin an qurşînên jîndar davêjin, da ku wan bitirsînin û qedexe bikin ku giliyan pêşkêşî aliyên pêwendîdar bikin.

Li Gulana 2020an. Z, Milîseyan dest danî ser stasyûna-malmewdana giştî-hilkişandina ava avdanê ji benda Gundê "Kifêrê" ya li ser Çemê Efrînê, û dest bi ferzkirina kirên bilind (li ser avdana her hiktarekê ji erdên çandiniyê li G. "Şadêrê" û derdorê) kirin, û bi bîr were jî ku berê komîtak ji xelkê deverê stasyûn bi rêve dibir û tenê buhaya lêçûnê ji cotkaran distand.

Û weha jî, xelkê ku li gund mane rastî rengereng binpêkirin û tewanan hatin, ji kuştin, revandin, girtinên bêsûcane, îşkencekirin, rûmetdaxistin û peresitandin û hin kiryarên din. Bi taybetî jî Hemwelatî "Nûrî Cimo Umer Şeref/63/sal", li 13.8.2020an. Z bi şev, di merc û hoyên nediyar de hate kuştin, piştî ku mala wî ji aliyê giropeke çekdar ve hate basmîşkirin. Û were zanîn ku di demeke berê de jî kuştiyê vêguneh li destpêka meha Tîrmehê 2019an. Z, li ser destên Milîseyên "Feyleq El'şam" hate revandin, û piştî ferzkirin û wergirtina vêrgiyeke diravî mezin ji mervên wî ew hate berdan.

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li 4.1.2023am. Z, Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Mabeta" hemwelatî "Ednan Mihemed Reşîd /60/ sal, Mahêr Mihemed Şêx Seydî /46/ sal" ji xelkê Gundê "Şêxûtka", bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re girtin, û piştî çar rojan ji hepiskirinê û ferzkirina vêrgiyên diravî yên bilind li ser wan ew

berdan; Weha jî li 9.1.2023an. Z Hemwelatî "Ferîde Reşo keça Ebdo /55/ sal" ji gund bi heman tuhmetê, û piştî sê rojan ji zîndankirinê û ferzkirina vêrgiyeke diravî li ser, ew li Bajarê Efrînê hate berdan.

- Li 7.1.2023an. Z, Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Bilbilê" Hemwelatî "Mihemed Selah Hisên /25/ sal", û li 9.1.2023an. Z hemwelatî "Ibrahîm Menan Xelîl /42/ sal, Mihemed Esmet Şêxo /24/ sal", ji xelkê Gundê "Kêla", bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re girtin, piştî ku malên wan basmîş kirin, û ta niha zorane bendkirî ne.

- Li 12.1.2023an. Z, Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Reco" Hemwelatî "Meryem Mihemed Şêxo/19/sal" ji xelkê Gundê "Qêsim" girt, bi behaneya ku ew di dema R.X a berê de di komeke folklorî ye dibistanî de bû, û li roja din jî berda. Divê were zanîn ku ew di wê demê de zarok bû.

**= Qutkirina darên zeytûnê:**

Piştî ku rûberên daristanên xwezayî û çandinî bi sedema qutkirina rêbazkirî ya fere û şewtandina mebestkirî kêm bûn, û bi rêjeya dora 60% ji rûberên wan ên giştî (xwezayî /18500/ hiktar + çandinî /21000/ hiktar = 39500 hiktar) li herêmê hatin qirkirin, vêca di vê Zivistanê de milîs û anîndeyan berê xwe dan qutkirina darên zeytûnê -çi qutkirina giştî yan a piçekî ya bê wijdan- bi rengekî fere, û wêne û perçevîdiyû rojane li ser têne derxistin û belavkirin, wek:

- Qutkirina bêwijdan ji dora /15/ daran re yên "Zaroyên Dilovanber Heyder Kenco" ji xelkê Gundê "Keferdelê Jorin", û /10/ darên "Mecîd Kemal" ji xelkê Gundê "Çolaqa" - li cîgeheke di ber Riya Efrîn û Cindrêsê de, û nêzîk Gundê "Tilifê" û balefirgeha çandiniyê.

- Qutkirina bêwijdan ji dora /20/ daran re yên zaroyên Malbata "Îbo" li Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa yê ku Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" li ser desteser dikin, û yekî ji wan tu fêde ji giliyekî ku pêşkêşî "Niyaba giştî" û "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" kirî nedît.

- Li Gundê "Maratê" - Rojavayê Bajarê Efrînê, Milîseyên "Firqit El'hemzat" bi şev bi şêwakî fere û tewşankî darên zeytûnê qut dikin, û jê ev hatin naskirin (/15/ dar ên "Ibrahîm Ibrahîm Eşbûk", /9/ dar ên "Osman Ibrahîm Eşbûk", /6/ dar ên "Ehmed Namî", û /20/ dar ên "Ebid El'rehman Hisên"), û herweha jî /10/ dar ên "Ebdo Eşkê" ji xelkê Gundê "Gundê Mezin" ê hevcîwar; Û weha jî "Aborxaneya El'hemzat" li G. "Maratê" cihe, nîsk û colbana ji serkêşên xwe re di nav zeviyên zeytûnan de -xwedî hebin an ne li wir bin- diçînin, bê ku yek wêribe protesto bike yan giliyekî pêşkêş bike.

- Milîseyên "Feyleq El'şam" li Gundê "Çençeliya" - Navça Reco, bi rengekî tewşankî darên zeytûnên qut dikin, jê dora /120/ dar ên "Zaroyên Dilovanber Bîlal Reşîd, Hisên Şêxo, Ebdelah Elî Derwîş, Hisên Ewnî Hebeş" hatin naskirin, û bê ku giliyên xelkê li ba Destlatên Dagîrketiyê tu sûdê bikin.

- Weha jî Milîseyên "Firqit El'hemzat", ji bo êzingkirin, çêkirina komirê û bazirganiyê, bi alavên giran bermayên daristanên Geliyê "Sarsînê" yên xwezayî ji Bajaroka "Reco" de bigir û ta Deştên "Şediya" bi aliyê Rojava ve hildikin.

**= Avakirina bargeheke leşkerî ye Turkî:**

Li 8.1.2023an. Z, Artêşa Turkiyê ya di avahiya dibistana navîn a berê de - Rojavayê Bajaroka "Reco" hin xwediyên zeviyên zeytûnên li girê kevneşopî yê li derbasgeha bajarokê bi anîndindan, ji wan daxwaza devjêberdanê ji wan zeviyan û erêkirina avakirina bargeheke leşkerî li ser kirin, û wan jî derfeteke kin jê xwest; Û piştî çend rojan Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Reco" hatin cem wan û ji bo girîngiya erêkirina daxwazê gefûgur dan wan; Were zanîn jî ku dora /300/ darî yên "Zaroyên Dilovanber Ezet Ebdo Doykê, Umer Bîlal Ne'isan" ji xelkê Gundê "Etmana" li ser wî girî hene.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li Siba Duşemê 9.1.2023an. Z û piştî lihevxurcilandin û amedebaşiyeke leşkerî ye şevayî, û di nav Bajaroka "Celemê" re - Başûrê Efrînê ta Cindirês, Çiyayê "Qaziqlî" û Navçên Şiyê/ Mabeta, "Desteya Tehrîr El'şam - Nesra berê" ya terorîst karwanek ji çekên giran, orte û sivik ji Idlibê guhest, da ku hebûna xwe li wir pesend û bihêz bike, û weha jî li ser Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" fişarê bike, da ku mercên wê yên ji bo rêvebirina Derbasgeha "Hemran - Navça Cerablusê" (ya ku Firqit El'sultan Mûrad gef daye ku dest dîne ser) ji aliyê "Tevgera Ehrar El'şam ve - perçeyê Rojhilat" -a bi ser "Desteyê" ve - bipejrîne; Û weha jî li 13.1.2023an.

Z, li herdu gundên "Feqîra û Çolaqa" - Navça Cindirêsê, li ser heman kêşeyê gizgizî kete navbera Milîseyên "Firqit El'hemzat" û "Ehrar El'şam".

- Li Siba Sêşemê 10.1.2023an. Z, bombeyeke teqîner li kêlek Gera Qabanê - Riya Turindê û Başûrê Bajarê Efrînê teqiya, û tenê ziyanin şênberî çêbûn.

Bêdengiya beramberî qutkirina zeytûn û daristanan tewan bi xwe ye, û erk û stubariya mirovahî, niştîmanî û ta olî jî li ser her kesekî/ke dûrbîn ferz dike ku bilez tevbigere, da ku vê dijîkirina bed û hovane biseknîne.

15.01.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- G. "Şadêrê" û çadir.
- G. "Besme" yê niştecîkirinê yê nimûneyî.
- Roxandina Zaretgeha "Şêx Rikab".
- Kuştiyê vêguneh "Nûrî Cimo Umer Şerîf".
- Qutkirina darên zeytûnê li G. "Maratê".
- Cîgeha "girê derbasgeha Reco" yê kevneşopî, ya ku bargeheke leşkerî ye Turkî dê li ser bê avakirin.